Dilbirîn	Xedra Seyid	Xidir Rakan	Hesen Remo	Hizbiya Selim	Ciwan Mehmûd	Ciwan Bedir	Ciwan Umer
Şensa Hiso	Şevîn Umer	Semer Seyid Elo	Seher Seyid Elo	Reça Hesen	Reça Hesen	Raman Fatimê	Dozgin Umer Ehmed
Viktoriya Naso	Umer Hecî Ehmed					Ebdilmecid Osman	Ebdislam Yûnis
Lîlav Hiso	Gulistan Mihemed					Katibe Ebdiruhman	Fewziya Mûsa
Merwa Mihyedîn	Mihemed Yûnis	Ezîz Dawûd	Izeddin Ehmo	Mihemed Sirac Mihemed	Muhened Ehmed		
Mihemed çîço	Hejar Salih	Nîvalî Osman	Nîsrîn Hiso	Nermin Ibrahim	Ismail Mihemed	Mistefa Ezîzan	Mizgin Mihemed
Mihemed Mehmûd	Ciwan Eyo	Nûra Eyo	Solin Masûm	Mihemed Masûm	Tolay Kermo	Yara Kermo	Ehmed Çîço

Ziman û Beyanameyên Serkirdeyan

Ferîd Mitani



«Dema ku ez li Newroza 2014 an amade bûm Encumena me ya Kurdî ku nûnertiya 10 partiyên Kurdîstanî dike beyanameya xwe ya devkî bi zimanê erebî got! Wê gavê ji min re diyar bû ku pêşengên me bi carêkê re xwe ji ziman şuştine, û hewl didin ku bi hesanî wêje û dîroka vî zimanê resen bînpê bikin û tûk bibin. Gelo kesê ku ziman û çanda min neparêze, û ji min re pênasane neke, Dê çawa pêşengî û nûnertiya min bibe!?»

Ziman jêhatêke nîhadî ye li bal mirovan, û tîsta ku mirov û ajalan ji hevr cuda dîke ziman e. Jiber ku ziman afênerê raman, plansazi û pêşveçûna hismendiyê ye...


xêzan diqede, û bi dawî dibe, lê belê ya giring ew e ku em nîrx û giringiya ziman nas bikin û ji xwe bipîrsin, gelo ta çî astê me guhdan û dîpîndan bi zimanê xwe kiriye...

rengêkî taybet e. Tenê bi saya ked û vekolîna kesên min Mir Celadet Bedirxan rêzimana me ya Kurdî bi sêweyêk nîvîskî hatiya berhevîna û çapkirin...

Kuştara Hisîça

“Tev- Dem” û Meclîsa Kurdî du pirojeyên cuda ne, her yek bi pirojeyêkê ve girêdayî ye, kûraniya wan pirojeyan diheft ta asta cihanî, ew ne jixwe re lihev nakin ”

Bêguman kuştara Hisîça çihê daxê ye, lê çima ew kuştara çebî? Di hemî dever û qanasan de dema ku pirojeyek netawî û nijadî tu-nebe û di çihê wê de pirojeyên partîyê çihê wê digrin û hevriki û berjewendiyên partîyê zêde dibin...



Luqman Silêman

Ev bawerîm kî heşeya me bi wan ramanan gareser nabe û her dibe kûrtir dibe, jiber ku berjewendi ji himbertê vî yekê mezîn dîba. Bîla berjewendiyanê xelkê bi hevrika me pêk tên lewma ji ew bi bixwazin ku wê hevriyê kûrtir bikin...

Roja Cîhanî Ya Şanoyê

“Îsal, nameya “Roja Cîhanî Ya Şanoyê”, bi pêntisa derhehêrê Polendayê bîrê Kirîstov Werlikovîskî hatîye nivîsandin.”

Wergêrandin ji zimanê Erebi bo Kurdî: Newafê Bîsar-Sûriyê. Qamişlo



Kirilov

dabûna Xwedayên Ewropî û kiristaniya wan haydar bûne diramim. Her wiha, îro, ez dikarim navê Maksêl Kozîj ji li wê listeyê zêde bikim.

Nameyek Ji Zindanê

Ev Name Ya Rojnamevan Şiyar Xelîl e, Ji Zindana Şamê Ji Bo Pirozkirina Cejna Newrozê Şandiye. “Ez Gelo kî Xweş im Ji Ber Ku Newroz Li Kobaniya Delal ya Mîvandar Be Îsal, Ji Ber Wisa Ji Kobaniya Delal Re Silav in Gerim dişînin”



Şiyar Xelîl

Gele min î hêja, cejna Newrozê li ew giştan pîroz be, tim hîn bîmin di xêr û xweşiyê de. Bîra û xweşên delal... Newroz cejnê pîroz e tê de evîn û azadî dibin weke Mem û Zînê...

meta alikariya ku binavê “Himîs di dil û rewanê min de. Pîşî girîna wî raghandina rêjîma Sûriyê ew derxist li ser ekranê xwe...



Rojnamevan Şiyar Xelîl ji bajejarekê Cîndirê ye, ku dikeve herêma Efrînê de, sê salan di amogeha raghandinê ya zanîngê Şamê de xwendiyê, wek rojnamevanekî serbixwe de kenala “Skeynawîs” ya erebî de kar dikir...

Bi Belge .. Şêx Ednan Heqî Yekem Bêjerê Kurdî Bîranînên Xwe Bi We Re Parve Dike



- Çavê min li hêviya yekîtiya kurdan qerimî.
- Em çar xortê Kurd bûn, ez û xortek ji Amûdê bû navê wî Ebdilwehab bû, Ebdila Mewrûf ji Kurdistan Iraqê bû, û mamoste Fûad Me'sûm.
- Bernameyên me ev bûn: Nûçeyên siyasi - Nûçeyên kurdewarî bi giştî- Bernameya rêzimanê kurdî- Bernameya stranan navê wê(Peyamên guhdêran)bû.
- Karê me rojê sê se'et bûn, du se'et ji wan ji wergir û amadeya nûçeyan re bû, û se'eta di ji weşanê re bû.
- Cemilê Haco ji min re got: Ezbenî tu li Misrê diaxivî em li vir ditirsin.
- Carnan ez ji rûpelan derdiketim û min ya dilê xwe digot.
- Rewşa min a aborî alîkariya min nake ku ez pirtûkên xwe çap bikim.
- Izgeha Anqera û Tehranê ji karê me nerazibûn didan, û timî karê berpisiyarê wan herdû Izgehan ew bû ku beşê Kurdî rawestînin?
- Me 50'î Cinêhên Misrî werdigirt, ez bi xwe gelek xwîngerm bûm û di karê xwe de gelek çalak bûm.
- Nexasim bavê min ji Celadet û Kamîran Bedirxan dût neket û ser ji hevdu qut nekirin.
- Dilê min li ser Welatê me Sûriyayê xemgîn e.

Hevpeyvîn: Ehmed Bavê Alan



Malbata Şêx Bîrahîm Heqî, bavê Şêx Ednan Heqî li seranserê Kurdistanê Pîr bi nav û deng in. Ew bi xwe dîndên Şêx Hisênê Şêx Xalidê Zêbarî ne. Şêx Xalid dema ku ji Zêbar daket Kurdistanê Bakur bi navê Şêx Xalidê Zêbarî hat nasandin. Li wir kurê wî Hisên dest bi xwendina olî kir, xwendina xwe bi dawî ji kir. Ji ber ew di xwendina xwe de jêhatî bû nav û dengê wî derket. Tekî û dibistanên olî vekirin, bû yekem Şêx di Kurdistanê Tirkîyê de.

Piştî ku şagirtên wî çêbûn, navê wî li Kurdistanê Tirkîyê derket, Bedirxan Paşa, Mirê Botanê, Şêx Hisênê Zêbarî kir lêvegerek ji mîrîşîniya xwe re.

Şêx Hisênê Xalidê Zêbarî, ne tenê nav û dengê wî di ola Mîslmaniyyê de derketibû. Lê belê ew bi xwe zaneyarekî zemanê xwe bû. Şêx Hisênê Xalidê Zêbarî wek ku me destnîvisên wî ditin, Zaneyarekî asîmanî bû, di destnîvisên wî de diyar e bê çawa di wê demê de ew i Goka Zemînê destnîvis kirîye, demjimêra roj û hevê û hemî demên rojê dane xuyakirin, navên welatê dût û nêzik li ser goka xwe ya zemînê neqîşandine.

Ersîfa Malbata Şêx Ednan


Heqî, pîr zengin e û bi cûmerdî Dr.Qanî' Heqî ew dane me ta ku em ji xwendevana re biweşînin. Şêx Ednan Heqî xwedê temenê wî ji me re dirêj bike, tevî ku tenduristiya wî ne saxlem e, û berî ku berê xwe bide koçberiyê, bi singek fi-reh em kirin Mêvanê xwe û axivî:

"Kurê min tu li ser çavên min hatî, tevî ku ez gelek têşim lê civata te dilê min geş dîke, çimkî tu ji min re stranê Bo-

jiyana min a Misrê ji te giring e. Vêce min xwendina xwe bi kar tanî, rojêkê Şêx Umer Wecdî têkilî bi min re kirin, Şêx Umer Şêxekî Ezherî bû "Wek ku bi erebî dibêjin" Ew ji kurdê ku li Misrê dijîn, lê koka wî ji Mêrdînê bû, ji bilî karê wî yê Ezherê ew bûbû birêvebirê beşê Kurdî di Izgeha Misrê de, ew beş nû ji hatibû çêkirin. Şêx Umer ji min xwest ku ez di beşê Kurdî de kar bikim, yekser min erênîya xwe da Şêx Umer, em çar

Umer, ew i ji pêşniyarê xwe didan me, û îmze dikir, ji weşanê re amade bû, weşana me her roj di se'et 1 e' nîvro de bû. Bernameyên me ev bûn: Nûçeyên siyasi - Nûçeyên kurdewarî bi giştî- Bernameya rêzimanê kurdî- Bernameya stranan navê wê(Peyamên guhdêran)bû. Me 50'î Cinêhên Misrî werdigirt, ez bi xwe gelek xwîngerm bûm û di karê xwe de gelek çalak bûm, rola min wek Şêx Ednanê Bîrahîm Heqî û dengê min dihişt Kurdistanê dihişt ku gelek guhdêrê beşê Kurdî hebîn. Min ji bi mîranî navê xwe eşkere dikir, û min li tiştêkî nedipirist.

Rojêkê Cemilê Haco ji min re got: "Ezbenî tu li Misrê diaxivî em li vir ditirsin"! Min gelekî banga yekîtiya Kurdan dikir, û Şêx Umer ji tîksir nedikir ku caran ez ji rûpelan derdiketim û min ya dilê xwe digot, ji vê yekê Izgeha Anqera û Tehranê ji karê me nerazibûn didan, û timî karê berpisiyarê wan herdû Izgehan ew bû ku beşê Kurdî rawestînin?



Xwesteka wan ew bû ku dengê Kurdan dernekeve, lê wê kî dengê min bisekîne, ji xwe hevalê min ê delal Dr. Fuad Me'sûm gelekî ji min û karê min razi bû, ta niha ji ew i pêwendiyên xwe ji min qut nekirine, timî ji telefonî min dîke.

Min xwendina xwe ya olî li Ezhera Şerîfî bidawî kir vgeriyam welêt, bûme mamosteyê wameyên ola îslamî li gelek dibistanê Qamişlo, û en li Şamê ji min wane dane şagirtan, û li dervî Sûriyayê ji min gelek mamosteyî di zanîngehan de kirîye.

Malbata me malbatê kevnar e, û navê wê li seranserê Kurdistanê de heyê, em ji gelê xwe tucarî dût neketine. Têkîlyên me gelek bi malbata Bedirxan Başa re hebûn, gelek peyamên malbata Bedirxan Başa li rex me hene hin ji wan ji bavpîrê min re bûn û hinê di ji bavê min re bûn, çimkî em Şêxê wan bûn, û lêvegera mîrîşîniya Botanê bûn, û li Sûriyayê ji malbata min nexasim bavê min ji Celadet û Kamîran Bedirxan dût neket û ser ji hevdu qut nekirin.

Min gelek berhem nivîsîne, û çap ji bûne, hin ji hene hin destnîvis in, rewşa min a aborî alîkariya min nake ku ez wan çap bikim, nexasim bîranînên min. Ji berehemên min: "Pirtûka Softîyê" ez tê de softîyê sîrove dikim, koka wê û bandora wê li ser civaka Îslamî, û rewşa wê gihayê ku?

Min gelek di xortaniya xwe guh dida zimanê Kurdî min bi Kurdî baş dizanî binvîsim û bixwînim ji, ta niha jî, lê piştî ku armanca min bû ku ez karibim di xwendina xwe a olî de gelek tiştan zelal û eşkere bikim, û di pirtûkên min yê çapkirî de diyar e.

Di xortaniyê de min gelek tişt dînvîsîn, û di rojnâme û kovaran de diweşandin, lê niha ji pêşî ku ez pirtûkên xwe yê girêdayî bi alfrandinê ji hêla olî de tiştêkî nikarim binvîsim.

Ez niha li Qamişlo me û va tu rewşa min dibînî, êşê pîr xwe li ser min zor kirî, hew çara êşê min dibe, rewş li welatê me Sûriyayê e, dibe ku ez koçber bibim ta ku ez karibim xwe deman bakim ji vê dibe ku di demê nêz de ez herim Tirkîyê. Zarokên min jî her yek li welatêkî dijî, tev ji bo ku karibin xwe û zarokên xwe xwedî bikin, bi rastî her kes min nas dike, min guh neda malê dinyayê, lewma rewşa min a aborî tenike û zarokên min bi welatên dinyaniyê ketine.

Tu dibêji çima tu xemgînî? Kurê min! Min bîriya Zarokên xwe kirîye. Dilê min li ser Welatê me Sûriyayê xemgîn e, çavê min li yekîtiya kurdan qerimî, rewş heştîyar e û diyar e em nîzamin em di çî rewşê de ne.

Têbînê: *Ji her giringiya vê hevpeyvîne me dit ku em careke di bîwîştin, ev hevpeyvîn di rojnâmeya Nûdem de weşiyaye.*



tan Pêdîxî, wêneyên kurdî ji pêş min dikî, û ya herî xweş ku em helbestan ji dibêjin. Qonaxên jiyana min pîr in, min jiyana xwe tev di xidmeta ol û peyama pêxember Muhemed de bîrand, wisa ji malbata min, em hatin nasîkirin wek ku te peşgotina xwe ji min re xwend.

Piştî serkeftina min di bawernameya duwayî de, bavê min berê min da Misrê ji bo ku li Ezhera Şerîv xwendina olî bixwînim, li vir wek ku min ji te fîam kir ku ev qonaxa xortê Kurd bûn, ez û xortek ji Amûdê bû navê wî Ebdilwehab bû, Ebdila Mewrûf ji Kurdistan Iraqê bû, û mamoste Fuad Me'sûm hevalê min i herî nêzik ew bû, niha bûye serok komarê Iraqê û tîkîlyên xwe ji min qut nekirine, serkêş û alîkarê me bû. Karê me rojê sê se'et bûn, du se'et ji wan ji wergir û amadeya nûçeyan re bû, û se'eta di ji weşanê re bû, piştî ku me pîrogramê xwe amade dikir, me dişand bîroya Şêx



Qamişlo Te Çi Dîtî...??



Dildarê Aştî

Bi çî gulê Piroz bikim cejna te Bi çî dîlî, Himbêz bikim bejna te İro xanim Tu bûka newrozê ye Li dor te kêfêrat e Şihîniya dozê ye... Birîna min bişkiyivî xewnên te jê dane der İro xanim seranser Xêlî bi halan û qirîn, Tîştê ji hawir dirfirin, Ne çivîk in, Pij in... gule û tîr in... Evîndar bûm ji mêj ve Ji dema ku xunceyan Sirûda baranê xwendin Ji dema ku sebnemê Rondika mîm Li ser dîma te jiber kir Û hîna tu pişik bû... Hîna nû peyv Li dor te dişikivîn nû heנגeyên pelendar Li kulîlkên arzeyê dîhîngivîn... Min dixwest Li nav darê çenge bîyan ez li şejna te rûnim Raserî kanya miradın Birînên xwe vepûnim Ji bêhna pûng û rihanê Helbestekê bi hûnim... Lê min di got; Belkî tenê arezwe.... Hîna ziwe...! Hîna raman tîz nebûne Tîlî bihêz nebûne... Û wîsa di gelê de Min bêdengî dibijart Di nav diruşmên kedî de Mebseta xwe vedîştaz Heta ku qerîna te hilçenandim Li zaxor û navbiran digeran-dim Gund û bajarokên min Li serwet û bixwetan raprandin Bend û sinor dibûrandin Bi hatanî Navê te dibecandin Qamişlo te çî dîtî...?!

Helbeçe



Ehmed Mustefa

Bi kuştinê nabin xelas Hêsrên xwinê çavan guvaşt Xûnav hew tê ji aşiman Gul û nêrgîz nabîskivîn Hêvî kuştin, ziman ji lal Cîger heland, dil kul kirin Zarok kuştin man bê nefes Hembêz vala man bê Dergûş Felek xayîna bextreşê Roja me reş tari kirin Helbeçe kir Hiroşîna Pênc Hezar Kurd, Qetîl kirin

Çendî



Anahîta Sîno

Çendin bîrîn li dil ketin Bi hêşiran te pîne kir Çendî şevîntirs û tarî Bi kenê xwe te imze kir... Di malzaroka xewnên te de Çendî hêvî ji ber te çûn Himbêz dikî êş û girî Tim bêdengî dirîşme bû... Bi hêviya hatina xewê Çendî caran bendewar bû Li ber çîra demên bê ol Her kêlikê giran bar bû... Li ser tevna şevên dirêj Her dirêse xewn û xeyal Bi evîne dihejine Dergûş zaroka delal... Çendî caran nivê sevê Destê te li erdê ketî Dîs radibû çav mîz dida Şev dibhurînav raketî... Ne sev tenê, temen pê de Cav ji te re her beqêçî bû Li hêviya mezinbûnê Dîl ûmejî tim birçî bû... Dilê reben li taxên te Her aşîq û qereçî bû Qet tîr nebû ji ditna te Tim parsek û xwazînçî bû... Ev in dilên dayikên me Welatekî bê sinor e Evînek e serbixwe ye Ev evîna herî li jor e

Sibehên Penaberiyê



Mendê War

Bi kizûra bîhvîla re bihna kulîkên biharê dikim Ji vî welatî Bi malana mexela re bihna mast û çaya sibê dikim Ji vî welatî Nîza çîma ez bihna hebûnê nakim Ji vî welatî? Ev welatê ke ez li qatî... Xewnên tîji îştexlok ne berhemên şevê ne yan min wê bi dîtana Hevalên zaroktiya min ne hemu rêbwarên rêya penaberiyê ne yan min wê bi dîtana Seyranên biharê ne yêd berê ne yan wê pîrsa min bikirane. Xwedî ji ne ê berêye yan nuhe ez ji wê nebame... Li nav naxerên sibehê de Li nav pêlên ba yê birikîrîne de Ez hew xwe ya dibim Hûn ji li min negerin dostên dilşewat.

Sibê Lê Nisanê ye Bila derew be Lê bi tenê em ji vê Avdarê xilas bibin!!?

Berivana Gelê Me



Ehmed Huseynî

Gul, kulîlkan baharan Hêşiniya ser daran Pir rindî pir ciwani Berivana ber mihan Şanaziya gelê me Havina welatê me Qemerê rabe were Heyrana bejna te me Birha te wek kevane Biskê te ji dervane Tu delala Kurdani Parê te wek şevana Canê min qurbana te Ez dile xwe bidim te Tu qîza gelê me vî Sareke ser serê te Dem ji me re bû xelat İro roja me hilat Berivana gelê me Ez çok vedim ber welat Mehmet Çobanoglu 08.03.2015 Stanol Min nan û kevok Min kitûmîten dile xwe ji ji boyî sibehê berhev dikirin... Hetanî ku roj bi ser min de çemîya, Anîha li Hisîçayê me Xwin xwîna min e Êdî hûn çîma dile min bi pûnga Xwedî ranapêçîni? Yûmis El Hekim ji Erebtî: Ehmed Huseynî

Asayîş



Dilgeş Resûl

Xortê asayîşê wek şerane Çeleng û mîr û jîr û hêjan Rengê aşîtiyê tev dixwazin Ji derd û eşa pir ciûda ne -2- Hêzên Asayîşê hêzên biraî ye Jiber mafên mirovan hatiye Xweşî û xêrxwezîya giştî ye Ji gel û mîletan re biran e -3- Li paristina gund û bajara Dikin dijî dijimînan û sistemkara Her dem sibeha heta êvara Li ser sinora ê navenda -4- Teyrê baz in li e'rd û ezmana Lat û kevir in wek çîyan e Gulê buharê binav û nişan in Sar û gerim havîn û zîstana

Dîmen 10

Ebas kîwarustemî Werger ji Eredî: bûyer



Weke delîva diho delîva iro wînda bû, û tîştê mayî rexneyeke ji rojan re. -2- Darên teka tek bi hezaran li çola tenahiya min Şîn tîn. -3- Li ser zîmanê min e tama arama tal, wê kîjan şerani wê bibê? -4- Di pêwariya te de ez û xwe guftûgoyan dikin, û bi hesanî, di her tîştê de em digehîjin rêkeftinekê. -5- Di pêwariya te de rojk roj e, roj roj e û şev şev e. Henteşiya te tevîhev kirîneke ji ronahiya hevê. -6-

Di pêwariya te de bi te re dipeyvim, di henteşiya te de bi xwe re dipeyvim. -7- Ez doza pareke ji te mestir ji tenahiya xwe dikim. -8- Di pêwariya te de roj bîst û çar kat e, di henteşiya te de carman kêmtir e, carman bêhtir e. -9- Hebûna bi te re min êşkence dike hebûna min bi min re min ditirsîne, ka nebin? -10- Min bi posteya lezok nameyêke tuje kin wertirî. -11- Dilê min ji dijwariya evîne selya ye.

Hûn Bi Xêr Bê Heseke



Xalid Umer

Heyv ji bo xatrê buharê Bûye wek "ezlekê Navbera Xabûr û Ceqoç Meşiyam wek pələkê Serxweşên agir girêdan Xwe bi xeml û xêlekê Kî dizane ku "ezalî Ketiye tirimbêlekê Qey dizane serxweşên a Gîr xwe nadin kêlekê Vê şevê seftan û huçik Bûne minna sêlekê Vê şevê destên biçûçîk Radîhejîm kêlekê Ez nîzanim çî re em kurd Her ku tîn ser rêlekê Mîrîna bê hay û hempa Tê ji "hind û "helekê Na buharê bê xeml û rewş e Li mi wek kavîlekê Na bîrîn kûr û vedar e Bêrixka min "Hesekê Agirê Newroz û ar e Dil kulê pupêlekê Pênciyî çend perperik çûn Dor şemala felekê Ax a..... X J'wê dilê min tîkewênê Hûn bi xêr bîn Heseke

Surûda Ala Rengîn



Burhan Hiso

Alê alê aalê Em ê hîldin li malê Al ê rakin li her der Kesê û sor, sipî û zer Kesê û sor, sipî û zer Alê alê aalê Emê hîldin li malê Rakin ala me kurdan Li çar parên Kurdistan Alê alê aalê Em ê hîldin li malê Alê alê, alê can Nexş û nav û hem nişan Nexş û nav û hem nişan Nexş û nav û hem nişan Alê alê aalê Em ê hîldin li malê Tev de bi hev re bêjin kurd namre bêjin kurd namre Alê alê aalê Emê hîldin li malê Em ê hîldin li malê.

Ez Ê Beytik Ketin Çelê hev

Fatma Savci Di laşê mişextiyê de, bi taya şevên xerîbiyê dikevim. Kesek nîne ku êvarên Mîdyadê li min bipêçe. Diwarên odeya şevbûherên koçberîya min bêxallî ne. Ti rêvî rastî min nayên, ku destanên di dawa min de li ser ruyê nav birêşînim...

Bawerzîna şeveqa havînê me, hênîkahiya binê kolikên nava werzan, ji hemî Riyan derketi me...durketi me... Tama behîvên ter û şevên kerîk ji feryadên min tîn. Sardarokên zarokatiya min û beranê helilê, xemlûxêza tora nava min e. Nikarim xwe ji gıyayêvk û indekoya çavên Nisêbinê neçînim... Ez û Beytik ketine çelê hev... Ku dengê sirsirkan te ji peyvên şevê, pişikêrîkên bêrikînê tîn di hewin li Bîneyên ser ruyê min. Li tîrêşên biraniman diwaşîm... Nikarim xwe bi sûretên ser kevîran bigîhêzîm...Di dergûşa zemên de, hitkekê bê bendik û şiyar dîminim... Sibatên sor xwe li nav birînan min didin... Pepûkeke westiyayî di guhê şevê de, ji dur ve dixwîn e. Di-fikirim: Ew kîjan birakujê kurd e, ji poşmanî li ber van dergîhê gerdûnê, wîha kelogîrî dixwîn e?...



Fatma Savci

Bo Doza Parastina Milletê Kurd Li Rojava.. Xweşêkirinek Li Pêş Wargehê Rêxistina Netewên Yekbûyî



Ji bo Parastina Milletê Kurd Li Rojava û belgekî tawanên ku bi serê wan de tên kirin gîrûpek ji jînên bajarê Qamişlo xweşêkirinek li ber wargehê rêxistina Netewên Yekbûyî li-

dar xistin. Tê de gelek siloyan û duruşm hatin hilandin, ji wan « Em doza lêpirsinekê di teqînê Heseckê de dikê » û « Em doza parastina jîn û zarokên xwe li Rojava dikin ».

Koma "Mitan" Ya Şano Çirîska Xwe Li Qamişlo Vêdixe



Di Festivala Şanoya Kurdî ya yekem de li Rojava ku çalakîyên wê di roja Pêncşemba 26/3/2015an li Qamişlo û bi çavdêriya Tevgera Çand û Hunera Dimuqratik destpê kir, koma Mitana şano ku ji

bajarê Heseckê hatibû şanoyek bi navê " çirûsk" li navenda Mihemed Şexo a çand û hunerê û bi amadebûna gelek komên şanoyê ên beşdar û kesê guhdêrên tevgera şano li Rojava pêşkêş kirin.

Semînerên " Hilbijartin Çi Ne..? " Lidar In



di çarçoveya bilmeta " Hilbijartin Çi Ne..?" ku rêxistina Civaka Sivîl û Dimuqratik çavdêriya wê dike û 21 rêxistin û sazî tê de beşdar in, Mamoste Şiyar Isa semînerê bi navê " Hilbijartinê Temîz û Operasyona Çavdêriyê" roja iniyê 27 Avdarê li hola Seyran

li Amûdê lidar xist. Tê de hilbijartin û pêşketina rewşa Dimuqratik ji Sêsed salî ta roja îro şîrove kir, dîwê ne nerînek li ser pîvanên navdewletî ên hilbijartinan anî ziman, û diyar kir ku ev pîvan di hilbijartinê nencumenê xweçihî li Kantona Cizîrê cih nagrin.

Saziya Barzanî a Xêrxwaz Mamosteyên Dibistana Rojava û Şagirtên Serkeftî Xelat Dike



Saziya Barzanî a Xêrxwaz Mamosteyên Dibistana Rojava û şagirdên Serkeftî li kampa Basrna û bi amadebûna cemarîner mezin xelat kirin. Li ser vê yekê mamoste Luqman

çelebî rêvebirê dibistanê got: Em de bê beramber kar dikin, û bawernameyên bilind di nav grûpa mamosteyan de heye, û Kampa Basrna ya yekem e ku ev dibistan lê vedibe

Li Berlînê filmekî kurdî xelat wergirt



Di Festivalê de ku 20ê Adarê destpêkirî bû, 76 kurtefilm ji 23 welatan beşdar bûn, yek ji wan welatan beşdar bi fermî Kurdistan bû ku bi 11 kurtefilman ci girtibû, festivalê rojêke taybet da kurdan û bi helkefta sersala kurdî di roja 23ê Adarê de her 11 kurtefilm bi beşdarî û amadebûna hejmareke ji revenda kurd û hunermendên sîneyayî ên kurd û biyanî hatin nîşandan, 2 ji wan kurtefilman bi piraniya dengên hatin hilbijartin bo finalê.

spasiya rêxerên festivalê û rêxerên beşa kurdî kir û hêvî xwestin ku salên bîst û sedî Kurdî azad û serbixwe be bi alîkariya Elmanya daku kurd bikarin baştir besdariyê di heman festivalê de bikin û baştir bikarin alogora Kulturê navbera Kurdistan û Elmanya de bikin.

Li gorî yasaya bîngêhîna Elmanya, Pelegrafa 20 rêza 2ê û yasaya Netewên Yekgirtî pelegirafa 21 rêza 3ê ku seyrvanana mafê dengdan û hilbijartina Filman heye li şûna Jury, di roja Finalê ku 28ê mehê hatibû dabîn kirin 18 kurtefilman ci girtin, piştî hemu hatine nîşandan ku zêdeyî 4 demjimêrê û 26 xolekan vekêşandî ku salon tîjî bîner bu, piştî dengdan li ser filman hatiyê kirin, di vavartinê de 3 kurtefilm serkeftin û yek ji weke nimoneyî hat hilbijartin ji aliyê serperistîyaya Festivalê ve.

Kurtefilmê Xaver Xylophone "Roadtrip" ji Berlînê bû yekem û "Microphone" ji Derhênanê Kerîmok ji Kurdistanê di rêza 2ê de hat û "Silver Surfur" ji Derhênanê Juliane Engelmann ji Elmanya rêza 3ê bidest xist, kurtefilmê "Gummifaust" ji derhênanê Mare Steck xelateke taybet wergirt.

Komeleya Hêlin Festivala " Kulîlkên Newrozê ya Duyemîn" Li Qamişlo Lidar Dixe



Bi helkefta cejnê Newrozê, komeleya Hêlin ya zaroka festivala " Kulîlkên Newrozê ya Duyemîn" di bin duruşma "Newroza Aştîyê" li hola Elmelekîyê û bi amadebûna cemarîner mezin lidar xist. Komên ku tê de beşdar bûn

ev bûn: Koma Hêlin a şanoya listokî livok - Zarokên Komeleya Sofîn - Peymangeha Saz Muzik - Peymangeha Mihemed şexo a Muzikê - Sîrê Rabê Şerîf Omerî - Hunermend Ciwan Sebrî.

Dayika 4 şehîdan Diçe Ber Dilovaniya Xwedê



Dayika Nufa İsmail ku li taxa Hilêliyê ya Qamişloyê rûdimîst, ev demek bû nexweş bû û bi gopal dimeşiya, çavên xwe li jiyane girt. Cenazeyê dayika Nufa rakirin Mizgefta Sefîq a li taxa Hilêliyê.

Dayika Nufa İsmail ku li taxa Hilêliyê ya Qamişloyê rûdimîst, ev demek bû nexweş bû û bi gopal dimeşiya, çavên xwe li jiyane girt. Cenazeyê dayika Nufa rakirin Mizgefta Sefîq a li taxa Hilêliyê.

Dayika Nufa İsmail ji wekî gelek dayik û malbatên kurd, ji her çarê û pêkatiyên rejimê gelek çê û azar kişandiyê. Her wiha gelek caran ji koçber bûye. Bi derketina Tevgera Aza-

diya Kurdistanê û belavbûna wê ya li Rojava re, ji bo dayika Nufa ji deriyê çihaneke nû vedibe. Di sala 1980'an de Abdullah Ocalan nas dîke, girêdan û hezkirina wê ya ji bo jiyanaazad her ku diçe zêde dibe û di vê oxirê de ji 4 zarokên xwe daye. Dayika Nufa di demên dawî de ji ber temenê borî pişgîrîkên tenduristiyê dijiya û bi gopal dimeşiya

Rengên Bo Pakrewanên Newrozê û Azadiyê Li HOLA Subarto



Di roja 26/3/2015an de li hola Subarto pêşengeck ji şewekara kurd Enûd Faris re bi navê « Rengên Bo Pakrewanên Newrozê û Azadiyê » vebû.

hemû tabloyên wê yên ku di dirêjahiya salekê de hatine amadekirin li ser mijarên sorêşa Sûrî, azadî, û jînê bûn.

Yekîtiya Rewşenbîran Li Kantona Cizîrê Helbestvan Tirêj Dibîr De Tine



Yekîtiya Rewşenbîran li " Kantona Cizîrê " semînerê li ser Helbestvanê Mezin Seydayê Tirêj di salvegera wî ya 13emîn de û bi amadebûna hejmarek ji nivîskar û helbestvan di 19 meha Avdarê de li hola Qesr Elnubela lidar xist. Bi rawestana li ser gîyanê helbestvanê Mezin Tirêj û

gîyanê pakrewanên sorêşa Sûrî dest pê bû, piştê ser mamoste Xalis Misewer kurtejiyana Seyda xwend, û dest bi xwendina helbesta hat kirin. Di dawiyê de hunermend Cemalê Tirêj hate xelatkirin, û ji xelata xwe diyarî mamoste Dilawerê Zengî kir

Hunermend Kawa Piştî 20 Salan Li Welat Derdikeve Ser Dikê



Hunermend Kawa ji bo beşdari Newroza Amedê bibe piştî 20 salan veşeriya Tirkiyeyê lê li balafirgehê hat binçavkirin. Hunermend Kawa êvara 16ê mehê li Stenbolê li Balafirgeha Ataturk peya bû û hat binçavkirin. Parçerê wî Ahmet Aysar çû serdanê û got ku heta sibê dê diyar bibe ka çawa bikin ji ber ku di sala 1996an de derbarê wî de doz hatîye vekirin, li ser wê de pirsan bikin. Serê sibê Kawa hat berdan.

Hunermerd Kawa piştî berdanê ji bo çapemenî wisa got: «Ji bo Newrozê ez hatim, ez hevî dikim ev dê ji bo azadî û aştî bibê wêstî. Ezê stranên xew ji bo azadîyê vebêjim.» Kawa got ku 18ê mehê li Cizîrê, 21ê mehê li Amedê û 22yê mehê ji dê li Stenbolê derkeve ser dikê û got: «Ez yek ji endamên Koma Berxwedan im ku li nav kurdan weki koma berxwedanê tê nasîn. Hevalên me yên din ji dê bèn û em hemû

bi hev re emê li ser axa xwe têkoşîna xwe bidomînin.» Hunermerd Kawa ku ji Mûşê ye ji sala 1995'an ve li derveyê Tirkiyeyê, li Evropanyê dijî. Kawa ku ligel bi tena serê xwe albumên wî hene, di nav di nav Koma Berxwedan ji cih digire û di nav albumên komê de ji stranên wî hene. Heta niha ev albumên hunermend Kawa hatine weşandin: «Ava Evlînê», «Şend», «Feryado», «Taya Dilal», «Rojava» heta niha

Asoyî

- 1-Bajarekî rojavayê Kurdistanê.
- 2-Bajarekî rojavayê Kurdistanê.
- 3-Bajarekî rojavayê Kurdistanê.
- 4-Ji bo pîrsa kesan, ahî (vajî).
- 5-Li jora rû, bi Erebi bandor (vajî).
- 6-Firaxeke xwarinê ye, ji lawirên kedî (vajî).
- 7-Heskirin, nivê hebûn.
- 8-Bajarekî rojavayê Kurdistanê.

Sitûnî

- 1-Bajarekî rojavayê Kurdistanê (vajî).
- 2-Ji zaravê zarokan, heskirin (vajî).
- 3-Ji lawirên kedî, firaxeke xwarinê ye (vajî).
- 4-Bi Erebi bandor, li jora rû (vajî).
- 5-Ahî, ji bo pîrsa kesan (vajî).
- 6-Bajarekî rojavayê Kurdistanê (vajî).
- 7-Bajarekî rojavayê Kurdistanê (vajî).
- 8-Bajarekî rojavayê Kurdistanê (vajî).

Xaçerêz

1	2	3	4	5	6	7	8
1							
2							
3							
4							
5							
6							
7							
8							

Bersiva 15

1	R	A	P	E	R	Î	N
2	A	D	A	R	K		
3	M	Ê	R		A	W	A
4	Û		Ê	V	A	R	Z
5	S	O	Z		R	A	Ş
6	A	L	E	Q	E	M	Ş
7	N	I	R	I	M	Ş	E
8		D	Î	R	O	K	Ê

www.buypress.com
f buypress | buypress
buypress@gmail.com
WhatsApp 00905368908543

büyer

Çavê Min Li Ala Min e ...



Mamik?

- Tiştê xweşik heye xwedê ew dayê, zana û emîye heft derî lê ye kî nezane bê mêji ye!
- Eyar heye, mû tune, xwe digivêşe gû tune?
- Ji tiştan ne tişt e, nikil weke xişt e, parsû li nava pişt e? Mûyê karan, li ser daran, di bin de distirin bi hezaran? - Deng tê ji ezmanan, qijî dike newalan? - bersiva hejmarê 15an: Demsal - Name - Firok - Nexşe - Fîl

Aqil Di Pendên Kurdi De

tu bi hiş be, wê xwarina te ne rij be
Ta min aqilê xwe naskir min malê
xwe xelas kir
Aqil û mal kirin bez , vî go ez û wi go ez
Aqilê hişk û stûr pêş xwedî dîke
riya dîr
Aqil taca zêrîne lê li ser serê her kesî nîne
Aqilê te hebe wê xizani dîrî te be
Aqilê sivik barê giran

Zûbêj

Kerê kurmî kur di korma gemar de werkir

RADYOYA
Dengê Pêşverû
Dengê Azadiyê
Dengê Rûmtê
Dengê Jiyanê
Dengê Partiya Dimoqrati Pêşverû kurdî Li Suriya
QAMISLO
Denge Peshveru | Denge Peshveru | 052-438760

99.0 FM
PÊŞVERÛ
99.0 FM